# Kurdish Students' Society in Europe

**KOMELEY XWÊNDKARANÎ KURD LE EWRUPA**

**كۆمەڵەى خوێندكارانى كورد لە ئەوروپا**

Adress: KSSE P.F 150151 1000 Berlin 15

Jimar: 2
Dem: 15.11.1988

Bonî hemû Liqên Komela me ya têkoşer!
Silaveke şoreşgêrane
Hevalên hêja,

li roja 21.10.1988 an, di navbera Komela me KSSE û Yekitiya Xwendekarên Cîhanî IUS de, li baregayê IUS li Prag çavpêketinek resmî pêkhat.
Di wê çavpêketinê de 4 endamên Sekrêtariyeta KSSE û 16 endamên Sekrêtariyet ji bal IUS de amadebûbûn.
Niwênerên KSSE supasî IUS kirin û dilxweşiya xwe ji bona Serokêtiya Wê derxistin bonî hilwestanên Wê û piştgîriya Wê ji Miletê Kurd re û bi taybetî ji bona rawestana IUS li dijî bikaranîna çekên kîmyawî ji bal rejîma îraqî faşî dijî Miletê Kurd. Herweha niwênerên Komelê daxwaziya bêtir piştgîrî li IUS kirin, û bi wirdî li ser rewş û zîneta Kurdistan raweştiyan û bi taybetî li ser rewş û zîneta Kurdistana Iraq û Miletê Kurd li wî perçî, ku roja îro li ber man û nemana xwe dide dijî dirtirîn û faşîtirîn rejîm ku hewel dide reha Kurdan ji binîve rake.
Herweha niwênerên KSSE basî Komelê, Kongirê Yekgirtî û Liqên Komelê jî kirin û daxwaziya bêtir îş û kar li gel IUS dan ber çavan ji bona bihêztirkirina rola KSSE li nav IUS, herweha çend pêşneyarên dinî pêşçav pêşkeşî Sekretariyeta IUS kirin.
Piştî wê çavpêketina fireh, çavpêketinin du û sê qolî jî pêkhatin:

1- Danîştinek li gel Cîgerê Serokê IUS(Niwênerê Komsomolê Lênînî).
2- Danîştinek li gel Berpirsiyarên Komîta Rojhilata Navîn û Komîta Efrîqya(Endamên Sekretariyeta IUS).
3- Danîştinek li gel Berpirsiyarê Komîta Asya(Endamê Sekretariyeta IUS).

Em dikarin bi kurtî bêjin, ku çavpêketinên me li gel Niwênerên IUS biserketî bûn, û cîgayê rezamendiya herdû rêxistinan bûn.

Li roja 22.10.1988 an çavpêketinek dostane di navbera niwênerên Sekretariyeta KSSE û niwênerên Yekitiya Giştî ya Xwendekarên Iraqî(Bîroya Derve) û Yekitiya Gencên Demokratî Iraqî(Pêwendiya Derve) pêkhat.
Di vê çavpêketinê de hersî rêxistinan bîr û bawerî li ser pirsistan bi hev dan zanîn, herweha basî şêwê bitundtir kirina îş û kar ligel hev li dahatû de kirin, û niwênerên wan herdû rêxistinan dilxweşiya xwe ji bona biserketina Kongirê me yê Yekgirtû derxistin.
Edî biserketina we daxwaza me ye.

Sekretariyet KSSE

لـــە زووترین کاتی ڕەخساودا وشەی (کورد) یان (کوردستان) لە ناوی کۆمەڵەدا لە لایەن کۆمیتەی بەڕێوەبەری گشتی یەوە جێگیر دەکرێت.

**Kurdish Students' Society in Europe**

**KOMELEY XWÊNDKARANÎ KURD LE EWRUPA**

کۆمەڵەی خوێندکارانی کورد لە ئەورووپا

Adress: KSSE P.F 150151 1000 Berlin 15

ژمارە ٢
ڕۆژ ١٩٨٨/١١/١٥

بابەت : نامەی ناوخۆ

بۆ هەموو لقە تێکۆشەرەکانی کۆمەڵەمان :

سلاوێکی نیشتمانپەروەرانەی گەرم .

هەڤالانی بەڕێز

بەم نامەیە دەمانەوێ لەم چالاکییانەی خوارەوەی سکرتاریەتی کۆمەڵە ئاگادارتان بکەینەوە :

● لەڕۆژی ١٩٨٨/١٠/٢١ چاوپێکەوتنێکی ڕەسمی لە نێوان ( کا ئیس ئیس ئێ ) و یەکێتی خوێندکارانی جیهان ( ئا یو ئیس) لە بارەگای (ئا یو ئیس) لە پراگە پێکهات چوار ئەندامی سکرتاریەتی کۆمەڵەمان و شازدە ئەندامی سکرتاریەتی ( ئا یو ئیس) ئامادە بوون . لەم چاوپێکەوتنەدا لە دوای ئەوەی وەفدی کۆمەڵەمان سوپاسی هەڵوێستی ( ئا یو ئیس)ی کرد بۆ پشتگیریان بۆ گەلی کوردمان و بە تایبەت بۆ وەستانیان دژی بەکارهێنانی چەکی شیمیاوی لەلایەن ڕژێمی فاشیستی عێراقەوە دژی گەلی کورد ، داوای لە ( ئا یو ئیس) کرد کە زیاتر پشتگیری لە خەباتی ڕزگاری خوازی گەلی کورد بکەن ، هەر بەو بۆنە زۆر بە دوورود رێژی بارودۆخی کوردستان بە گشتی و بارودوخی کوردستانی عێراق و گەلی کوردمان لەو پارچەیەدا بۆ کۆبوونەوەکە ڕوون کرایەوە . هەروەها سیاسەتی ڕژێمی فاشیستی عێراق و بەکارهێنانی چەکی شیمیاوی بۆ لەناوبردنی گەلەکەمان خرایە بەرچاوان . پاشان بارودۆخی خوێندکارانی کورد لە ناوەوە و لە دەرەوە و کۆنگرەی یەکگرتووی خوێندکارانی کورد ، یەکگرتنەوەی ریزی خوێندکارانی کورد باس کرا . دوابەدوای وتووێژی نوێنەری کۆمەڵەمان ، چەند داخوازییەکی گرنگ خرایە بەردەمی نوێنەرانی سکرتاریەتی ( ئا یو ئیس) . ئینجا جێگری سکرتێری گشتی ( ئا یو ئیس) سوپاسی وەفدی کومەڵەمانی کرد بۆ ئامادەبوون لەم چاوپێکەوتنەدا و بەم شێوە دەرگای پرسیار و وەلام کرایەوە . ئیتر بەشی یەکەمی چاوپێکەوتنەکەمان کوتایی هات .

بەشی دووەمی چاوپێکەوتنەکەی وەفدی کۆمەڵەمان لەگەل ( ئا یو ئیس) بە دوو قۆلی و سێ قۆلی بەم جورەی خوارەوە بوو :

- دانیشتنێک لەگەڵ جێگری سەروکی ( ئا یو ئیس) ـ نوێنەری کومسمولی لینینی ـ
- دانیشتنێک لەگەل لێپرساوی کۆمیتەی روژهەلاتی ناوەڕاست و کومیتەی ئەفریقایی ( ئەندامی سکرتاریەتن )
- دانیشتنیک لەگەل لیپرساوی کۆمیتەی ئاسیایی ( ئەندامی سکرتاریەت)

ئەمە کورتەیەکی ئەم چاوپێکەوتنە بوو ، کە لەلایەن هەر دوولا جێگەی پەسندی و ڕەزامەندی بوون .

● هەروەها لە ١٩٨٨/١٠/٢٢ چاوپێکەتنێکی دۆستانە لە نێوان نوێنەرانی سکرتاریەتی کۆمەڵەمان و نوێنەرانی یەکێتی گشتی خوێندکارانی عێراق ( بیروّی دەرەوە ) و یەکێتی لاوانی دیموکراتی عێراق ( پەیوەندی دەرەوە ) پێک هات ، هەرسێ لایەن پەیوەندی هاوکاری و دوستایەتی یان لەگەل یەک دەربڕی و نوێنەرانی ئەم دوو ڕێکخراوە خوشحالی خۆیان دەربڕی بە بۆنەی سەرکەوتنی کۆنگرەی یەکگرتووی کۆمەڵەمان .

ئیتر بۆ پێشەوە بۆ زیاتر نواندنی چالاکی لە پێناوی خزمەتکردن بە خەباتی ڕەوای گەلەکەمان

مەکتەبی سکرتاریەت

---

* لە زووترین کاتی ڕەخساودا وشەی (کورد ) یان ( کوردستان) لە ناوی کۆمەڵەدا لە لایەن کۆمیتەی بەڕێوەبەری گشتی یەوە جێگیر دەکرێت .

اتحاد الطلبة العام في الجمهورية العراقية
جمعية الطلبة الاكراد* في اوروبــــا
اتحــاد الشبيبة الديمقراطي العراقــي

## بـــــــلاغ مشـــــترك

تـوطيـداً للاواصـر النضاليـة بيـن منظمـاتـهـم ، التقـى فـي اواخـر تشرين الاول / اكتـوبـر ١٩٨٨ ، منـدوبـون مخـولـون مـن سـكرتـاريـة جمعيـة الطلبـة الاكـراد فـي اوروبـــا ، مكتب العلاقــات الخــارجيـــة لاتحـاد الشبيبة الـديمقـراطي العـراقـي ، مكـتب فـروع الخـارج لاتحـــاد الطلبـــة العـام فـي الجمهـوريـــة العـراقيــة .

فـي اللقـــاء اكـد منـدوبـو المنظمـــات الثـلاث مجدداً علـى اهميـة تعميـق العـلاقـات الكفاحية القـائمـة بينهـم وعبـر مختلـف الاشـكال والاسـاليب .

وحـرص المنـدوبـون علـى تـأكيـد مـواقـفهـم التضـامنيـــة مـع نضـال الشـعب العـراقي ، والشـعب الـكردي فـي مختلـف ارجـاء كردسـتان ، وخـاصـةً جمـاهيـر كردسـتان العـراق التـي تتعـــرض لحمـلات ابـادة وحشـية علـى يـد النظـام الـدكتـاتـوري الفـاشـي الحـاكـم .

كمـا اكـد اللقـاء ضـرورة بـذل مـزيـد مـن الجهـود لـدعـم واسـنـاد فعـاليـــات وسـيـاســة الاتحـاديـن الطليعيين ، اتحـاد الشـبيبة الـديمقـراطي العـالمي واتحـــــاد الطـلاب العـالمـي ، وخـاصـةً فـي مجـال النضـــال مـــن اجـل الســـلام والحيــــاة والـديمقـراطيـــة والتقـدم .

علـى صعيـد اخـر ، جـدد المنـدوبـون بـاسـم منظمـاتـهـم حـرصهـم البـالـــغ علـى المسـاهمـة الفعـالـــة ، فـي التحضيـرات ، وفـي المشـاركـة النشـيطة فـي المهـرجـان العـالمـي الثـالـث عشــر للشـبيبة والطلبــــة ( بيـونـغ يـانـغ ١٩٨٩ ) والـذي سـيستضيفـه شـباب وطـلاب جمهـوريـــة كـوريـــا الـديمقـراطيــــة .

هـــذا وقـد تـم الاتـفـاق علـى تجـديــد هــذه اللقــاءات المشـــتركـــة بـالنظـر لاهميتهـا البـالغــة .

| | | |
|---|---|---|
| مكتب العلاقات الخارجية<br>لاتحـاد الشبيبة الديمقراطي العراقي | مكتب فـروع الخـارج<br>لاتحاد الطلبة العام في الجمهورية العراقية | سـكرتاريـة<br>جمعية الطلبة الاكراد في اوروبـا |

اواخـر تشـرين الاول/ اكتـوبـر / ١٩٨٨